

Bêje wana, wekî ez  
*wana hiz dikim*

Eyantîya derheqa hizkirina  
Xwedê ya hindava xwe da bistînin

Coys Mayêr

Xudana çapa ewlin, ya kitêba New York Times-ê,  
ya ku ji kitêbên mayîn zedetir hatîye frotanê

Bêje wana, wekî ez  
*wana hiz dikim*

Eyantîya derheqa hizkirina  
Xwedê ya hindava xwe da bistînin

# Coys Mayêr

Xudana çapa ewlin, ya kitêba New York Times-ê,  
ya ku ji kitêbên mayîn zedetir hatîye frotanê

Mafên xudana kitêbê: © 2003, 2007, Coys Mayêr

Hemû maf parastîne. Li gora qanûna WAY, ya sala 1976 a, ya derheqa mafên nivîskarîyê de, tu parçekî vê çapê bêyî destûra çapîkirê vê kitêbê nikare careke mayîn bi tu cûrekî bê xebitandinê, belavkirinê, yan jî nava sistêma xweyîkirina înfomasîyona de, yan jî derbaskirina li cem yekî mayîn, bê xweyîkirinê.

Unless otherwise indicated, all Scripture quotations are taken from The Amplified® Bible (AMP). Copyright © 1954, 1962, 1965, 1987 by The Lockman Foundation. Used by permission.

Scriptures marked NKJV are taken from the New King James Version. Copyright ©1979, 1980, 1982 by Thomas Nelson, Inc.

Scriptures marked KJV are taken from the King James Version of the Bible.

FaithWords  
Hachette Book Group USA  
237 Park Avenue  
New York, NY 10017

Visit our website at [www.faithwords.com](http://www.faithwords.com)

First Edition: February 2003  
Reissued: October 2007  
10 9 8 7

FaithWords is a division of Hachette Book Group USA, Inc.  
The FaithWords name and logo are trademarks of  
Hachette Book Group, Inc.

ISBN 978-0-446-69205-2  
LCCN 2002115636

# Serecem



Naverok	5
1 Xwedê te hiz dike	7
2 Gelo ez anegorî wê yekê baş im?	12
3 Hizkirin eleqet e	18
4 Hizkirin, bawerî û îtbarî	24
5 Ji tirsazayê	35
6 Hizkirin destê xwe dirêj dike	40
7 Hizkirina Xwedê wê we biguhêre	43
Bila cêribandina te ya emirê Nû hebe	45
Duayê xilazbûnê	46



# Naverok



Ez bawer dikim, ku meriv ji hemû tiştî zêdetir hewcê çi ne, ew eyantîya hizkirina Xwedê ya şexsî ye çawa şexs. Ez bawer dikim, wekî ev femdarî wê bibe bingeh, li ser kîjanê gerekê mesîhîyê bi jîyîna serkevtî bisekine. Bona me zanistîya bingehîn, ya derheqa hizkirina Xwedê de, hewce nîne, lê pêwîst e ku dilên me de eyantîya hizkirina Wî hebe. Tenê Ruhê Pîroz dikare wê eyantîyê bide. Û Ewê wê eyantîyê wî çaxî bide, wextê ku em dora hizkirina Xwedê bifikirin, hizkirina Xwedê jîyanên xwe de xweyî bikin û wê eyantîyê bi rîya Gotina Xwedê û duakirinê bigerin.

Gelekî hêsa ye, ku wê yekê qebûl bikin, wekî Xwedê temamîya cîhanê gelek hiz kir, wekî Ewî Îsa şand, ku bona gunehê her yekî bimire. Feqet diqewime hinekî dijwar e bawer bikin, wekî Xwedê awqas te hiz dike, ku Ew Îsa bişanda ku bona te bimira, eger tu li ser rûbarê vê cîhanê merivê tek- tenê bûyîayî.

Bi salên dirêj çawa mesîhîkî acizbûyî min destpê kir fem bikim, ku hizkirina Xwedê kîjan e. Bi destî Ruhê Pîroz Xwedê bi merdanî li ser dereca şexsî ya here bilind hizkirina xwe ya hindava min de da kîvê. Hema ewê eyantîyê temamîya emirê min û rîya min, ya tevî Wî daye guhartinê.

*Bêje wana, wekî ez wana hiz dikim*

---

Ez bawer im, wekî ew hemû tiştê ku tuê vê kitêbê de bixwînî, wê femdarîya nû, ya derheqa hizkirina Xwedê de bona te bîne. Ez bawer im, wekî bi rîya vê kitêbê tuê birçîbûna wê yekê texmîn bikî, ku vê eyantîyê werguhêzî ya xwe bikî. Ez bang dikim, ku tu vê kitêbê hêdî bixwînî û wê çawa rênîşa fêrbûnê bidî xebatê û dora wan fikira bifikirî, kijana tuê nava rûpelên mayîn de bibînî.

Ez bi cûrê şikestî vê kitêbê raberî te dikim, bi zanebûna wê yekê, ku ez bêyî Xwedê û femdarîya eyantîyê tu tişt nînim, ew yek tenê bi saya kerema Wî bona min hatîye dayînê.

# 1

## Xwedê te hiz dike



*“Çimkî Xwedê dinîya usa hiz kir, wekî Kurê Xweyî tayê tenê berva da, wekî her kesê ku Wî bawer bike, wunda nebe, lê jîyîna wî ya heta-hetyê hebe.”*

— YÛHENNA 3:16, NKJV

Xwedê dixweze, ku malbet hebe û Ewî em çê kirine, ku em bibine lawên Wî. Ew naxweze, ku em mînanî zarokên biçûk bişuxulin, lê Ew dixweze ku em mînanî kur û keçên Wî bişuxulin. Ew dixweze, ku em Wî va girêdayî bin, Wî hiz bikin û îzinê bidin ku ew jî me hiz bike. Xwedê dixweze ku em aminaya xwe li Wî binin û em destê xwe wî çaxî dirêjî Wî bikin, wextê ku em hewce bin. Ew dixweze ku tevî jî me her yekî nava eleqeta şexsî de be.

Ji me gelek meriv derheqa gotina Yûhenna 3:16 de li ser fikirên berfireh ne. Em wa dibêjin: “Belê, ez zanim, wekî Îsa bona cîhanê wefat bû”, lê “cîhan” ne koma meriva ye neeyan e, bona kîjana Îsa wefat bû. Ew bona me her yekî wefat bû. Ew bona te wefat bû.

Eger tu li ser rûbarê vê dinîyayê merivê tek- tenê bûyîayî, wî çaxî Îsa wê hema xût bona te wefat bûya. Ewê nava her zêrandinekê re derbas bûya, yên ku Ewî bona te dîtin. Xwedê



te awqasî hiz dike! Ew te bi hizkirina heta-hetayê va hiz dike (binihêre Yêrêmîya 31:3).

Rojekê, wextê ku min avtomaşîne diajot, Xwedê gote min: “Coys tu çira çavê min î. Dijmin carekê re hat got: “Baş, gelo nava firnaxbûnê de eva çapa mezin nîne? Lê bi fikira te tu kî yî?”. Û ez fikirîm: “*O!, ez gerekê usa nefikirim*”.

Ew ku çawa tê gotinê, ku em cuda ne û bûne xwudiyên pêşkêşên baş, bi merîfetê û karebûna va, kîjan dijî fikirdariya me ya merivatiyê ne. Feqet rastî ew e, wekî ji me her yek şexsek e, yê ku ji aliyê Bavê me de bi cûrê cuda hatiye çêkirinê. Xwedê pircûretiyê hiz dike û em tu cara gerekê texmîn nekin, wekî tiştêkî nava me de usa nîne, eger em mînanî wî merivî nînin, kîjanî em nas dikin.

Wextê ku ez derheqa wê yekê de difikirîm, ku Xwedê çi gotiye dilê min, wî çaxî min jinek anî ber çavê xwe, ya ku li sûpêrmarkêtê li rex qutîke bi sêva va tijî sekinî bû. Wî çaxî ewê jinê li sêva nihêrî û paşê destê xwe dirêj kir ku wê sêvê hilgire, ya ku li ber çavê wê ya here baş dihate kivşê. Min kemala berbirîbûna Xwedê wî çaxî fem kir, wextê ku Xwedê digot, ku ez bona Wî “sêva” here baş im. Ez meriveke cuda bûm. Carana usa tê fikira meriva, wekî ew yek rast nîne, lê Xwedê her yekî usa dinihêre. Ew nabêje, wekî tu bi rastî yê herî başî, lê yên mayîn yê here xirab in. Xwedê dibêje, wekî em hemû jî cuda ne. Derheqa wê yekê de nava Gotinê de hatiye diyarkirinê, lê Gotin bona me her yekî ye. Tu çira çavê Xwedê yî.

Wî çaxî min ew yek qebûl nedikir, çi ku Xwedê dicêriband bigota min, çimkî min xwe gunekar texmîn dikir, wextê ku ez

bi xwe derheqa xwe de tiştên bedew difikirîm. Piştî du roja min Încîla xwe vekir û gotina Zebûr 17:8 hate ber çavê min. “Tu min çawa çira çavê xwe xweyî bike û bin sîya perên Xwe da min veşêre”(NKJV). Min got: belê, bi rastî ew Xwedê bû. Ez çira çavê Xwedê bûm. Her car, wextê ku ez derheqa wê yekê de difikirîm, min xwe çawa yekî cuda texmîn dikir. Gelo tu zanî, wekî Xwedê dixweze, ku tu xwe çawa yekî cuda, qîmetlû, giranbiha û hizkirî texmîn bikî?

Meriv dilê xwe de dixwezin xwehizkirî bin. Xwedê me wî cûreyî çê kirîye. Gelek meriv bawer dikin, wekî Xwedê vê dinîyayê û Îsa hiz dike, lê bona wan meriva dijwar e bawer bikin, wekî Xwedê bi cûrê şexsî wana hiz dike. Feqet Gotin hîn dike, wekî Xwedê me awqasî hiz dike, çiqwasî Îsa hiz dike. “Çimkî Bav Kur bi cûrê nazik hiz dike û hemû tiştî nîşanî Wî dike, çi ku Ew dike. Ji van kara zêdetir jî, tiştên hê mezin wê bide eyankilrinê, bona ku hûn hijmekar bin û bi zendegirtîbûnê va tijîbûyî bin” (Yûhenna 5:20). Xwedê nava vê gotinê da dibêje: “Ez van hemû karên mezin dikim û ezê bi destî Îsa hela hê karên hê mezin bikim, ku tu zendegirtî bimîni”(şirovekirina xudana kitêbê). Xwedê dixweze me zendegirtî bihêle, bi kirina karên mezin, yên bona razîbûna me.

Em van hejmarên Kitêba Pîroz dixwînin û gelek cara texmîn nakin, ku Xwedê dixweze ne tenê bona me bike, lê Ew usa jî dixweze bi destî me bike. Xwedê dixweze, ku em dîna xwe bidine wan karên mezin, yên ku ewî bi destî Îsa kirine û paşê em bawer bikin, wekî Ew dixweze bi destî me karên hê mezin bike. “Eger yek bi cûrê îzbatî bawerîya xwe li Min bîne, wî çaxî ewê

bikaribe wan kara bike, kîjana Ez dikim û Ewê karên hê mezin bike, çimkî Ez diçime li cem Bavê Xwe” (Yûhenna 14:12).

Her roj Xwedê bona meriva gelek tiştî dike, çimkî Ew wana hiz dike, lê meriv wê yekê nabînin. Ew wê yekê fem nakin. Her roj, wextê ku ro derdikeve, ew bona te û min derdikeve. Cûrên kulîlka yên cuda-cuda şîn dibin, ku em razîbûnê bistînin. Dinîya, ya ku Xwedê bona me çê kirîye, gelekî bedew e. Ew cihekî usa ye, li kîderê em dikarin bijîn û razîbûnê bistînin. Nava serê kitêba Destpêbûnê ya ewlin da nivîsar e, wekî Xwedê serwêrtî da mêriv, got, bona ku ew wê yekê bo xebitandina rêşûrsên li ser topa dinîyayê bide xebatê û wana bona kara Xwedê û mêriv bide qulixkirinê.

Wextê ku baran wedê xwe da tê, ew bona te tê. Wextê ku berf tê, ew jî bona te tê. Hemû gav ji alîyê Xudan da tèn emirkirinê û Ew her dem dîna xwe dide te.

Nava kitêba Qanûna Ducarî 7:9-da nivîsar e: “Bizanibe, qebûl bike û fem bike, wekî Xudan Xwedêyê te, ew e Xwedê, Xwedêyê amin ku peyman û huba xwe ya amin heta hezar nisilî xweyî dike, bona wan yên ku Wî hiz dikin û emiren wî diqedînin.

Hizkirina Wî ya hindava me de ya heta-hetayê ye û bêyî tu qewil û qirara ye. Ji me gelek meriv difikirin, wekî me bi teribandin û şaşîyên xwe va Xwedê daye westandinê, feqet em nikarin Wî bidine westandinê. Tu jî nikarî usa bikî, ku Xwedê îdî te hiz neke. Hizkirin tişteki usa nîne, ku Xwedê dike, lê Xwedê hema bi xwe hizkirin e.

Eger tu difikirî, ku tu merivekî gelekî xirabî, ku Xwedê te hiz dike, wî çaxî tu şaş dibî. Bona Xwedê çeleke usa ya kûr

tune, li kîderê ew nikare peya bibe û ji wir derkeve. Bona dasekinandina te bernama wî heye. Ew ne tenê gunêhên te afû dike, wextê ku tu bi bêqelpî ji Wî hîvî dikî, lê Ew wana bîr dike û bi çiqwasî va Rojhilat ji Rojavaê dûr dikeve ku awqasî Ew gunêhên me ji me dide dîrxistinê (Zebûr 103:10-14, AMP).

Diqewime tu bêjî: min Îsa dilê xwe de qebûl kirîye û Wî hiz dikim. Feqet ez pirsê didime te: Tu bi çiqwasîva bawer dikî, wekî Xwedê te hiz dike?

Hizkirina Xwedê ya heta-hetayê û bêyî tu qewil-qirara berbirîbûneke gelekî zelal e. Ew usa jî bingeha sereke ye, ya ku Xwedê gerekê dayne nava emirê te, bona ku tu hemû tiştî fem bikî. Ez bawer im, wekî hizkirina Xwedê nava emirê me de destpêka qencbûna hemû tiştî ye.

Ew yek girîng nîne, ku tu çi zanî û çiqwasî karên Xwedê lêkolîn dikî û digerî. Eger tu wê yekê nikarî qebûl bikî, wekî Ew bi merdanî û belaş te hiz dike, wî çaxî tê li ser rîya xwe ya tevî Wî nikaribî gelekî pêşda herî. Em bi rîya baweriyê ji Xwedê distînin, lê bawerî jî bi hizkirin dişuxule (Galatî 5:6). Bi vî cûreyî, eger em hizkirina Xwedê qebûl nekin, wî çaxî em nikarin tu tiştî qebûl bikin.

Hizkirina Xwedê usa jî derfetê dide me, ku em bêyî tirs bijîn (A Yûhenna 4:18), çi jî bona derbaskirina emir û mîyaserkirina navê me gelekî girîng e. Tê hizkirina Wî, ya hindava xwe de qebûl bikî? Ew nayê frotanê û tu nikarî bi kirina karên bi rehm wê yekê bikirî... Ew hemû tiştê ku tu dikarî bikî, qebûlkirin, qebûlkirin û qebûlkirina hizkirina Xwedê ye.

## 2

# Gelo ez çiqwas lazim e baş im?



*“Ev guman meriva nade acizkirinê, şaşkirinê, yan jî nade şermê, çimkî hizkirina Xwedê dilên me de bi cûrê Ruhê Pîroz, Yê ku bona me hate dayînê, raxistî ye. Çimkî wextê ku em hela hê zeyîf bûn (em bêtaqet bûn, ku alî xwe bikin). Mesih wedê Xwe de bo bêbawera mir. Niha wê tiştên ecêbmayînê be, eger yek emirê xwe bona yekî heq bike qurbanî. Nenihêrî wê yekê, wekî bona xêrkirekî merd, meriv dikare bimire. Feqet Xwedê eyan kir û zelal hizkirina berbi me da kivişê, wextê ku em hela hê gunehkar bûn, Mesih bona me mir: Niha bi çiqasî va em hatine afûkirinê (aza hatine berdanê û eleqeta me ya tevî Xwedê, ya rast heye?). Bi xwîna Wî emê jî hêrs û acizbûna Xwedê xilaz bibin. Çimkî wextê ku em hela hê dijmin bûn, bi mirina Kurê Wî, em Xwedê re li hev hatin. Bi çiqwasî va ew yek îzbatî ye, ku em li hev hatine, emê bi rîya emirê Wî (jî nava mirîya rabûyî) jî serwêrtiya gunehê herroje xilas bibin.”*

— ROMAYÎ 5:5-10

Ji me gelek meriv diqewime bifikirin, wekî Xwedê me hiz dike hetanî wî çaxî, hetanî ku me şaşî nekirîye. Gelek meriv hema bi xwe xwe hiz nakin û usa dertê, wekî ew tên ser wê fikirê, ku Xwedê wê wan va hijmekar nîbe. Feqet Încîl dibêje: “Çi ye meriv, ku tu wî bîr tînî?”(Zebûr 8:4). Em efrandarîya Xwedê ne, Ew me hiz dike, çimkî

Ew me hiz dike. Ew hizkirin e (binihêre A Yûhenna 4:16). Xwedê me hiz dike, çimkî Ew dixweze me hiz bike.

Ew te hiz dike û tu bona wî cuda yî. Ew yek dide kivşê, ku tu merivekî cuda yî. Hewce nîne, ku tu mînanî min bî û ez jî mînanî te. Feqet tê bêbext bibî, eger tu emirê xwe usa derbas bikî, emirê xwe himberî yên mayîn bikî û tevî wan bikevî nava lehçê. Bi wî cûreyî tê mecalê bidî dijmin, ku ew bêje te, ku tu awqasî baş nînî. Rastî ew e, wekî tu li ber Xwedê gerekê “gelekî baş” nîbî. Îsa dewsa te “gelekî baş” bûye. Ewî bona gunehê te biha da û ew cezakirin stend, layîqî kîjanê tu bûyî.

Încîl dibêje, wekî Ewî çiqwas lazim bû te hiz kir, ku bona te mir û tu bi çiqwasî va niha bi xwîna Wî afû bûyî. Gelo Ew te hiz dike? (binihêre Romayî 5:8-9). Ew bi rastî te hiz dike, wekî gunehên te yên herroje vedişêre û te jî her neheqîkê paqij xweyî dike.

Bi saya vê mînakê tê bizanibî, ku bi fikira min Xwedê çawa şaşî û kêmasîên me dinihêre. Niha, zarokeke sê-çar salî bîne ber çavê xwe, ya ku her dem dîna xwe didê, ku dayîka wî çawa karên malê dike. Ew zarok dayîka xwe awqas gelekî hiz dike, wekî ew derdana avê ya biçûk hildide, paşê jî parçekî pîne hildide û diçe li ber pencerê. Zarok bi wî pîneyî pencerê awqas baş paqij dike û paşê jî pêjgîrê hildide û peyî re paqij dike.

Bêguman dawîyê xetên zol-zolî dikevî li ser pencerê û tê bêjî pencere qirê je. Keça biçûk pînê herî baş hildabû, dabû xebatê. Feqet ew keç tê cem dayîka xwe û bi dengê xweyî nimiz, nazik dibêje: “Dayê, dayê, min pencera te şuştîye. Min karekî awqas baş bona te kiriye. Dayê, ez te hiz dikim”.

Dayîka ku hiz dike dibêje: O! Te karekî gelekî baş kiriye. Bo alîkarîyê ez ji te razî me. Paşê, wextê ku zarok tişteki mayîn va mijûl e, dayîka wê ewê pencerê careke mayîn paqij dike. Paşê ew ber dilê keça xwe de tê, ku ew ji wê alîkarîyê hîvî bike û fêr bibe ku çawa bi cûrê rast kar bike.

Eva ew e, çi ku Xwedê bona me dike. Ew dikare hemû tiştî usa bike, eger em Wî hiz bikin û bi gotina Wî pêşda herin (binihêre Romayî 8:28). Eger tu tişteki dikarî gelekî baş bikî, wî çaxî tu zanî, ku wê yekê çawa bikî. A hema eva ew hemû tişt e, çi ku Xwedê ji te hîvîyê ye. Ew dikare û wê alî te bike, ku tu pêşkevî, eger tu Wî bigerî. Ewê mînanî şikilê Xwe te ji rûmetê berbi rûmetê biguhêre (binihêre B Korintî 3:18).

*“Çimkî Ew Yê ku Xwedê şand, mînanî Xwedê xeber dide;(berbirîbûna Xwedê îlam dike). Çimkî Xwedê Ruhê Xwe sînorkirî nade, lê pêşkêşa Xwedê-Ruh bê sînora e. Bav Kur hiz dike û hemû tişt daye destê Wî (aminaya xwe lê anîye, teslimî Wî kirîye)” (Yûhenna 3:34-35).*

Rojekê, wextê ku min ev gotin lêkolîn dikir, min bi şabûn kire qîrîn, wextê ku min fem kir, wekî Xwedê Ruhê Xweyê sînorkirî nade me. Ew tişteki biçûk nade. Ew merd e û dikare gelekî, bi merdanî û ji wî hemû tiştî zêdetir bide, ne ku çi em hîvî dikin, yan jî difikirin (binihêre Efesî 3:20).

Nava Qanûna Ducarî 7:6-7-da Xwedê dibêje: “Çimkî tu cimeteke pîroz û cuda yî bona Xudanê xwe. Xudanê te tu bijartî, ku tu bona Wî nava hemû mileta de bibî cimeteke cuda. Ne ku bona wê yekê, ku hûn ji mîletên mayîn zêdetir in,

lê Xudan we hiz kir û hûn bijartin, çimkî hûn ji hemû mileta hindiktir bûn”.

Eva tiştêkî usa ye, kîjan gerekê we bide ruhdarkirinê. Xwedê dibêje: “Min tu hizkirî û got, ku tu pîrozî. Min tu eyankirî ku tu cudayî. Min tu bijartî ne ku bi wê menîyê, ku tu gelekî baş î, lê bona wê yekê, ku ez te hiz dikim”. Tu zanî, ku Xwedê çi dixweze, ku tu îro bikî. Ew dixweze ku tu hizkirina Wî qebûl bikî. Terka wê yekê bide, ku her dem derheqa nerazibûnên xwe de Xwedê re gilî bikî. Ew yek tiştêkî nû nîne. Ew derheqa te de hemû tiştî zane. Ew usa jî zane, ku tu dikarî wî çaxî jî şaşîyên çawa bikî, wextê ku Ew tevî te eleqeta îzbat bike.

Pirsgirêka here mezin, ya ku li cem me geleka heye ew e, ku em xwe hiz nakin. Em bawer nakin, wekî Xwedê me hiz dike û usa jî bawer nakin, ku kesek me hiz dike. Em vî cûreyî difikirin: *Ew çawa dikarin min hiz bikin? Ez awqas xirab im.* Eger tu bawer bikî, ku tu merivekî xirabî, wî çaxî tê destpê bikî kirên xirab bikî. Tu nikarî rûyê wê şaşîyê de pêşda bilivî, ya ku dilê te de derheqa te de çê bûye.

Wedekî usa hebû, wekî pirsgirêka min ya here mezin ew bû, ku min xwe hiz nedikir û min pir’anîya wedê xwe bona wê yekê xerc dikir, dicêriband xwe biguhêrim û bibime yeke usa, çawa ku ez difikirîm. Ez difikirîm, wekî ez gelekî xeber didim û min dicêriband xwe ker bikim. Feqet, wextê ku min xwe ker dikir, ez diketime nava dêprêsiyaê û sifetê min dihate guhartinê. Hemû kes dixwestin bizanibûna ku bona çi min xwe ker kirîye. Paşê min gote wan: *Feqet we min re got, ku devê min mezin e. Min rihet bihêlin. Ez dicêrbînim xwe ker bikim.*



Ez nikarim te re bêjim, ku çend sala ez nava halên cûre- cûreyî re derbas bûme, halê mînanî ewê gilîkirina min. Hetanî niha jî rûyê devê min de ez her dem dikevime nava halekî xirab. Gelek meriv, yên ku bi rastî gelekî xeber didin, merivên ne mînanî xwe re zewicîne. Wî çaxî devê te diha mezin tê kivşê û mîrê cin her dem wê derheqa wê yekê de bîne bîra te. Ew gelek cedandina dide xebatê, ku tu xwe neheq texmîn bikî û ew te gunekar dike.

Xwedê dixweze, ku tu ji gunehkarîyê azad bibî, feqet bona wê yekê gerekê bawerî û serxwebûna te hebe. Gelo tu zanî, wekî kûraya gunehê usa tune, kîjanê tu dikarî li ser xwe texmîn bikî û bona şaşîya xweye kirî, yan jî şaşiyên paşerojê bihakî mezin bidî? Diqewime bona te dijwar be, ku tu bawerîya xwe li wê yekê tînî, wekî Xwedê wî çaxî te hiz dike, wextê ku te şaşik kirîye.

Mîrê cin te bi wan fikira va dizêrîne, ku tu çiqwasî xirabî. “Te niha ew yek kir.- ew dibêje. Tu çi difikirî, tu kî yî? Xwedê wê tu cara te dua neke, tu gerekê diha baş bişuxulî. Tu niha nikarî şedetîya meriva bidî. Xwedê nikare te bide xebatê. Ewê caba duayên te nede. Tu tu tiştî nikarî rast bikî”.

Wî çaxî gerekê qewatê bibinî, bisekinî û bêjî: Bavo, min şaşî kiriye û ez hîvî dikim, ku Tu min bibaxşînî. Ez dilê xwe de bêqelp im, ez baxşandina Te dixwezim. Û paşê mîrê cin re xeber bide. Bîne bîra wî, wekî Îsa bona gunehê te biha daye, tu afûkirî yî û ji guneha û dîwanê aza bûyî. Niha pêşda here û emirê xwe derbas bike. Gumana xwe bide ser Xwedê û bona merivên başqe bibe dua.

Diqewime tu vî cûreyî difikirî: Ez *dîsa wan tiştên xirab dikim*. Ev wede, wextê ku ez usa difikirîm, hetanî ku min qîrar

qebûl kir, ku ez êdî bona tu tiştî xwe gunehkar nekim. Wextê ku tu êdî gunehkar nekî, wekî te şaşî kirîye, wî çaxî ew yek wê alî te bike, ku tu careke mayîn wê yekê nekî.

Texmînkirina guneh û gunehkarkirin her dem te hetanî wê astê dizêrînin û te usa diavêjine nava dêprêsiyaê, ku tu nikarî azad bibî. Ew yek te dide sistkirinê û her dem ketina nava guneh gelekî hêsa dibe. Ew yek mêrivê serbixwe def dide, ku pêşkêşa afûkirina Xwedê qebûl bikin û neyêne gunehkarkirinê. Tu gerekê bi bawerîyê bişuxulî û ji ketina nava guneh paşda bisekinî. Dijminê te re bêje: “Tu difikirî, wekî rûyê gunehê te de tê xwe xirab texmîn nekî? Rûyê wî gunehî da tu gerekê lap kêm çend sehetê xwe xirab texmîn bikî. Te bi rastî tiştêkî xirab kirîye”. Û tu gerekê vî cûreyî bêji: “Na xêr, ezê tu cara xwe xirab texmîn nekim”. Pêşda wê bona te dijwar be ku tu wê yekê bikî, lê paşê ew yek wê diha hêsa be.

Îşaya 53 de derheqa wê yekê de hatîye nivîsarê, wextê ku Îsa gunehên me hildane ser xwe, Ewî usa jî gunehên me hetanî dîwanê bar kirin. Mîrê cin naxweze, ku tu ji dîwanê aza bibî. Bo çî? Çimkî eger tu gunehkarkirî yî, wî çaxî tu nikarî ji hizkirina Xwedê lezetê bibînî. Gunehkarkirin te ji Xwedê dide cihêkirinê û tu nikarî lezeta Hazirîya Wî bibînî. Gunehkarkirin guhdarîya te ji Xwedê dide dîrxistinê û guhdarîya te tîne ser te.

Ji gunehkarkirinê aza pêşda here û bawer be, wekî wextê ku Xwedê dibêje, ku kerema Wî bes e, ku gunehên te veşêre, hema wê yekê Ew bi wî meremî dike. Ew te hiz dike û kerem û baxşandina Wî bo te pêşkêş in. Roja îroyîn wana qebûl bike.

### 3

## Hizkirin eleqet e



*“Em zanin (fem dikin, nas dikin, anegorî lêkolînê û cêribandinê ha ji pê hene) û em bawer in (hişk digrin, bawariyê û aminayê cî û war dikin). Bo wê hizkirinê, ya ku Încîlê de hindava me de hatiye diyarkirinê. Xwedê hizkirin e û yê ku nava hizkirinê de dijî û Xwedê jî nava wî de dijî.”*

— A YÛHENNA 4:16

Tu çawa dikarî diha zêde derheqa Xwedê de pê bihesî? Ew yek girîng nîne ku Ew çiqwasî te hiz dike. Eger tu derheqa hizkirina Wî de ha ji pê tuneyî, wî çaxî ew hizkirin tu tişteki zêde nikare bide. Derheqa wê yekê de bifikire, ku tu çiqwasî baş xwe texmîn dikî, wextê ku yek hizkirinê hindava te de dide kivşê. Wextê ku tu zanî, ku hizkirî yî, ew yek gumanê li cem te pêşda tine. Xwedê te hiz dike û ew dixweze wê hizkirinê nîşanî te bide. Ew her kesî dewatî li cem Xwe dike, ku eleqeta kûr, nêzik û şexsî hebe. Ew dixweze tevî wî hemû tiştî bibe, çi ku em dikin. Ew dixweze, ku em her dem tevî Wî qise bikin, çawa hevalên baş.

Gelo eleqeta te ya bi rastî û şexsî tevî Xwedê heye? Tenê ew yek, ku tu xwe mesîhî hesab dikî, nade kivşê, wekî tu tevî Xwedê nava eleqeta hevaltîyêye baş de yî.

Gelek sala ez Mesîhî bûme, hetanî ku min destpê kirîye, ku bi cûrekî nêzik nêzikî rîya Xwedê bibim. Roja yekşemê ez diçûme civînê, û li wir min xebateke rezedilvanîyêye biçûk mîaser dikir. Feqet nava emirê min de Xwedê cîhê merkezî de nîbû. Min xwe tê bêjî vala texmîn dikir. Niha Ew Yê ewlin e, derheqa Kîjanîda ez sibê zû difikirim û Yê dawîye derheqa Kîjanî de ez şev difikirim. Em nava temamiya rojê de bi hev re hevaltîyê dikin. Xêncî qulixkirina bo Xwedê û razîkirina Wî, ez tu tiştê zêde naxwezim. Di hundurê me de rêyeke vala ya ji aliyê Xwedê de çêkirî heye, kîjanê tenê Xwedê dikare tijî bike. Tu kes nikare wî cihî tijî bike. Tu bi çiqasî va rast nêzikî eleqeta tevî Xwedê dibî? Gelo tu hazirî Wî û xwestina Wî daynî pêşîya hemû tiştî? Tu dikarî mînanî Pawlos van gotina bêjî: “Çimkî em bi Wî dijîn û dilivin û hene” (Karên şandîya 17:28).

Xwedê te hiz dike û tu bona Wî cuda yî. Ewî tu çêkirî, ku tu tevî Wî hevaltîyê bikî. Eva xwestina Wî ya here mezin e û xwestina Wî ya tam e bona emirê te. Destpêka her rojekê Ew dilê te de xeber dide: Siba te xêr, ez te hiz dikim. Eger te ew gotin ji Wî nebihîstine, wî çaxî tu dikarî destpê bikî wan gotina guhdar bikî û bawerîya xwe li wana bînî.

Hevalekî min tiştêkî wa anîbû ber çavê xwe. Bav diçe malên merivê ku li Amêrikayê dijîn, wî çaxî, wextê ku ew şebeqê ji xewê radibin. Bav hazir bû tevî wan meriva hevaltîyê bike û qîse bike. Ew dora sivrê rûdinî. Meriv radibin, tèn û diçin. Wana her dem digote Xwedê: Xwedê, hinekî jî li wir bimîne û ezê hinekî dereng bêm. Wextê ku ez vî karî ser hevda bînim,

ezê tevî te qise bikim. Xwedê, ezê diha dereng tevî te hevaltîyê bikim. Xwedê, diha dereng. Xwedê, diha dereng.

Dawîya rojê hat, Xwedê gelekî melûl ji male derket, çimkî wê rojê tu kes nehat, ku tevî Wî qise bike. Hemû kes awqas bi wa gotî karên xwe yên girîng va mijûl bûn, wekî bona Xwedê wedê wan tune bû.

Bona Xwedê awqas mijûlbûyî nîbe, eger wedê te tune, ku tu tevî Wî derbas bikî û dua bikî, wî çaxî tu ji çapê der mijûlbûyî wede hilde, bona ku tu bêjî Xwedê ku tu çiqwasî Wî hiz dikî. Wextê ku li vê dinîyayê hemû tişt ser hevda bê, wî çaxî xêncî Xwedê tu tiştên başqe wê tunebin. Eger eleqeta te ya tevî Xwedê tune ye, wî çaxî diqewime paşê bona destpêkirina wê yekê hinekî dereng be. Van axirîya bavê min wefat bû û ez şam e bêjim, wekî sê sal pêşda, pêşîya wefatbûna xwe, ewî Îsa çawa Xilaskirê xwe qebûl kir. Neniherî wê yekê, wekî bavê min çû Ezmîn, ewî lezeta jîyana bi xwestina Xwedê nedît. Ewî her dem bo xwe emirê xwe derbas dikir. Gerekê usa nîbe, ku tu dawîya emirê xwe bi yazixî bêjî, wekî te emirê xwe li ser tiştên bêfikir derbas kirîye. Wede pêşkêşa ji aliyê Xwedê de dayî ye. Ê em hemû gerekê guhdarîyê bidine li ser, bibînîn ku em wedê xwe li ser çi xerc dikin. Tu zanî, wekî wedê me yê xerckirî emê tu cara nikaribin paşda vegezin. Wedê ku me tevî Xwedê derbas kirîye, pêşkêşeke baş dide me, lê gelek tiştên mayîn bi bahê bilind lezeta arzan didin.

Ez pêşniyar dikim, ku bi wedê salekê îzinê bidî Xwedê, ku Ew te hiz bike. Hizkirina Wî yekîtîyê, aşîtîyê, şabûnê tîne nava

emirê te. Tu awqasî gerekê çawa lawê Wî bişuxulî. Bizanibe Ew Kî ye û destpê bike Wî baş nas bike.

Nava A Yûhenna 4:16 de nivîsar e: “Eger em zanin (fem dikin, nas dikin, anegorî lêkolînê û cêribandinê ha ji pê hene) û bawerin, (qewîn digrin, bawerîyê û aminayê diatînin) wê hizkirinê, ya ku Xwedê hindava me de dide kivşê”.

Diqewime tu nikarî şebeqa xwe hizkirî texmîn bikî. Diqewime ênêrgîya te tune rûyê wê yekê de temamîya rojê tu bin pozê xwe de dikî mirte-mirt û roja xwe usa derbas dikî. Tu wî halî dikarî bidî guhartinê, bi gotina xeberên bawerîyê. Bi dengê bilind van gotina bêje: “Xwedê min gelekî hiz dike, ez çira çavê Wî me û bernama Wî ya baş bona min heye”. Eger dewsa pirsgirêkên xwe tu derheqa Xwedê û Gotina Wî de xeber bidî, wî çaxî tu dikarî temamîya roja xwe biguhêrî. Milyaket dixwezî derheqa Gotina Xwedê de guhdar bikin, lê ne ku derheqa şikyatên me de.

Tu gerekê bi xwe xwe re xeber bidî bizanibî, wekî tu bi hizkirina Xwedê va dorgirtî yî. Încîl dibêje, wekî Xwedê te kefa destê Xwe de nîşan kirîye (Îşaya 49:16). Ez dikarim bibînim, ku Ew çawa ji jorê dibêje min: “Destên min binihêre. Gelo ew bedew nînin? Ez wana gelekî begem dikim. Awqasî lawên min binihêre, ew nava kefa destên min de nin”. Tu kefa destê Xwedê de nîşankirî yî, çawa bîranîna hertimî, wekî Ew te hiz dike û dixweze tevî te hevaltîyê bike.

Bira bira te de bimîne, wekî gerekê ji Xwedê razî bin û her dem eleqeta hevaltîyê ya tevî Wî pêşda bibin. Carana diqewime

tu bixwezî xebata xwe bidî sekinandinê û bi tabûna li ber Wî razalixîyê îlamî Xwedê bikî, wekî tu Wî nas dikî, bêjî Wî, ku Ew çiqwasî baş e. Xwedê hiz bike! A Yûhenna 4:16-17 de nivîsar e: “Xwedê hizkirin e, û ewê ku nava hizkirinê de dijî û disêwire, nava Xwedê de dijî û disêwire û Xwedê jî nava wî de dijî û disêwire. Nava vê yekê de (bi saya yekîfî û eleqeta tevî Xwedê) hizkirin dibe ya tomerî û dighîje mîyaserbûna tevî me bona ku wextê roja axretê aminaya me hebe”.

Bi zanebûna wê yekê, wekî Xwedê te hiz dike, tu aminaya hindava Wî da dest tînî. Hemû duakirin wê wî çaxî bèn, wextê ku tu îzinê bidî Xwedê, ku Ew te hiz bike. Ew dukirin bawerîya diha mezin, serkevtina nava guneh, aşîfîya dilê te de, qenckirin, emirê bi pêşkêşên Wî va tijî û şabûn in. Gelek cara em wekî mayîn difikirin û dibêjin: “Berê ewlin ez gerekê Xwedê hiz bikim û paşê îzinê bidim, ku Ew min hiz bike”. Ez bawer im, wekî pêşda tu gerekê îzinê bidî, ku Xwedê te hiz bike. Ez difikirim, wekî tu nikarî hizkirina xwe ya hindava Xwedê de bidî kivşê, hetanî ku tu îzinê bidî Wî, ku Ew te hiz bike. Încîl dibêje, ku em gerekê Wî hiz bikin, çimkî pêşda Ewî em hiz kirin (A Yûhenna 4:19).

Ez te re dibêjim, ku tu hevaltîyê tevî Xwedê bikî, lê tu çi cûreyî dikarî wê yekê bikî? Wextê ku Xwedê gote min, ku ez tevî Wî hevaltîyê bikim, ez li cihê xwe rûniştim û min got: “Niha, çi bûye, Xwedê”? Belê, bi rastî min nizanibû, ku ez çawa tevî Xwedê hevaltîyê bikim, çimkî wî çaxî min bi rastî nizanibû,

ku Xwedê çiqwasî min hiz dike. Ê min fem nedikir, wekî Ew dixweze, ku her dem ez hevalê Wî bim û rêberîyê li Wî bikim.

Dêmek, gavekê biavêje û destpê bike. Mecalê bide Xwedê û ewê te fêr bike, ku tu çawa tevî Wî hevaltîyê bikî. Ezê necêribînim, bona hevaltîya tevî Xwedê formûlekê pêşniyar bikim. Ez naxwezim, ku tu bi jimarên xalên yek, du, yan jî sê pêşda herî. Ez dixwezim, ku tu bi Ruhê Wî yî Pîroz va bêyî rêberkirinê. Xwedê dixweze, ku tu tevî Wî lezetê bibînî. Anegorî Încîlê Ew mala te ye.



## 4

# Hizkirin, aminayî û bawerî



*Çimkî (eger em) nava yekîtiya Mesîh Îsa de (nin) ne sunetkirin tişteke e, ne jî nesunetkirin: lê bawerîya ku aktîv e, bi ênêrgîayêva tijîbûyî ye û bi hizkirinê kar dike.*

— GALATÎ 5:6

Ji me gelek meriv gelek wede xerc dikin, dicêribînin bawerîyê dest bînin. Em zanin, wekî bêyî bawerîyê meriv nikare li Xwedê xweş bê (binihêre Îbranî 11:6). Dêmek, em dişuxulin, cedandina nahêvşînin, bona ku bawerîya diha zêde hebe. Feqet, bawerî ji dil e û tu wê yekê bi saya heyîna eleqeta hevaltîê ya bi hizkirinê, ya tevî Xwedê û guhdarkirina Gotina Wî, dest tînî. Bi rastî ez nikarim te hîn bikim, ku bawerî çi ye. Feqet ez dikarim te fêr bikim, ku prînsîbên bawerîyê kîjan in, bona ku tu nava bawerîyê de birçîbûnê texmîn bikî û hemû tiştî bikî, ku wê yekê dest bînî. Bawerî dest e, kîjanî tu dirêj dikî û ji aliyê Xwedê de qebûl dikî.

Terka şerkarîya bona destanîna bawerîyê û ya bona razîkirina Xwedê bide. Wî wedeyî û cedandinên xwe li ser derbaskirina tevî Xwe xerc bike, bi hizkirina Wî û qebûlkirina hizkirina Wî.

“Çimkî em bi bawerîyê diçin, (em jîyanên xwe didine qeydekirinê, em bi xwe bi fikir û bawerîya xwe serkarîyê li xwe dikin, bi qedirgirtina eleqeta Xwedê ya tevî mêriv û tiştên xwedêtîyê, bi îtbarîyê û cedandina xwepêşkêşkirinê, em wî cûreyî dilivin) ne ku bi dîtina çava” (B Korintî 5:7). Carekê, wextê ku min ev gotin dixwend, min texmîn kir, wekî Xwedê hinek tiştên dînamîk dibêje dilê min. Min dicêriband, ku ez bi bawerîyê pêşda herim. Nava hemû halên jîyana min de ez dixwezim bi bawerîyê pêşda herim. Nava gotina jorin de tê gotinê, wekî ezê bikaribim nava bawerîyê de bigerim, bi hesabildana wê yekê, ku ez tevî Xwedê nava eleqeta çî cûreyî de me. Hinekî bisekine û derheqa vê yekê de bifikire. Pirsê bide xwe, ku fikira te, ya derheqa eleqeta tevî Xwedê çî ye. Ew merivê ku difikire, wekî ew li ber çavê Xwedê heqe, wî çaxî ew gerekê hîvîya wê yekê nibe, ku wê bikaribe nava bawerîyê de bigere. Em bi saya Îsa Mesîh hatine afûkirinê (binihêre B Korintî 5:21). Heqîtiya me li ser wê yekê nehatîye bingehkirinê, ku me çî kirîye, yan jî em gerekê çî bikin, lê ew yek li ser karê Îsa, yê mîyaserkirî hatîye bingehkirinê. Ew merivê ku bawer dike, wekî ew feqîrekî neaçix e û Xwedê wî hiz nake, wê nikaribe nava bawerîyê de bigere.

Nava Galatî 5:6 de hatîye nivîsarê, wekî bawerî bi hizkirinê kar dike. Gelek meriv difikirin, wekî fikira vê gotina Kitêba Pîroz ew e, ku eger ew bikaribin wan meriva hiz bikin, wî çaxî bawerîya wan wê bişuxule û ewê bikaribin wî hemû tiştî bistînin, çî ku ew jî Xwedê bixwezî. Nenihêrî wê yekê,

wekî Xwedê dixweze, ku nava hizkirinê de bigerin, lê gera nava hizkirinê de tiştê bûyînê nîne, hetanî ku em bi xwe îzinê nedin, ku Xwedê me hiz bike. Eva tiştêkî gelekî zelal e. Em nikarin ji tiştêkî paşda bisekinin, ji kîjanî em naxwezin paşda bisekinin. Min gelek sala cêribandiye tevî meriva nava hizkirinê de bigerim, çimkî min zanibû, wekî ew yek temîya Xwedê ye. Feqet ez çend cara rastî neaçixîyê hatim, hetanî ku min hizkirina Xwedê, ya hindava min de qebûl kir. Bi çiqasî va zêde fikira min, ya derheqa min de baş bû, bi awqasî va gelekî min dikaribû hizkirina bêqelp hindava merivên başqe de bida kivşê. Eger te bi rastî bizanibûya, ku Xwedê çiqwasî te hiz dike, wî çaxî wê bona te awqas dijwar nîbûya, ku pirsên te bihatana helkirinê. Meriv nikaribû helkirina hewcetiye xwe bistînin, çimkî ew bi rastî bawer nakin, wekî Xwedê wana hiz dike û dixweze hewcetiye wana tijî bike û wana dua bike.

Diqewime tu vê yekê bêjî: “Ez dixwezim bawerîya xwe li wê yekê bînim, lê ez çawa bawer bikim?” Hizkirina Xwedê nava te de heye û tenê pêwîst e, ku tu wê hizkirinê nas bikî, wextê ku Xwedê wê yekê nîşanî te bide. Încil dibêje: “Em gerekê Wî hiz bikin, çimkî pêşda Ewî em hiz kirin” (A Yûhenna 4:19). Bona te wê tiştê bûyînê nîbûya, ku te Xwedê hiz bikira, eger tu guman nîbûyayî, ku Xwedê pêşda te hiz kir.

Ew hizkirin nava te de, dilê te de ye. Xwedê te hiz dike. Tu gelekî başî. Tu bedewî. Tu bi merîfetî. Tu giranbiha yî. Xwedê te hiz dike. Li temamiya cîhanê tu kes wê te awqasî hiz neke, çiqwas xwedê te hiz dike. Tu çiqwasî zêde derheqa hizckirina

Xwedê de bifikirî, tê awqasî zêde bikaribî bawerîya xwe aza berdî, bi wê jîyanê bijîyî, ya ku Xwedê bona te qehrar kirîye.

Xêncî Xwedê tu kes bo te lazim nîne, lê Xwedê wê merivên başqe dayne nava emirê te. Rastî ew e, ku eger xêncî te û Xwedê tu kes tune bûya, wî çaxî hemû tişt wê bo te baş bûya.

Xwedê wê bibe hevalê teyî herî baş. Ewê bibe hevalê te, eger hevalê te tun ye. Ewê bona te bibe dayîk, yan bav, diqewime yê te tunene. Ew hemû tişt e, ew hemû tişt e, hewcê kîjanayî tu. Şaşyê neke, bi hîvîkirina ji Xwedê, wekî Ew bona te tenê tišta bike. Ji Wî hîvî bike, ku nava emirê te de cîhê Wî diha gelek be. Hîvî bike, ku Xwedê te bi temamî Xwe va tijî bike (binihêre Efesî 3:16, 19).

Xwedê te hiz dike û dixweze, ku hewcetîyên te û xwestinên dilê te tijî bike. Wextê ku mayîna nava Wî de te xweş bê, wî çaxî Ewê tišta bide te, bi rîya bijartina rîya Xwe û wedê Xwe. Xwedê gote Bira hîm, ku Ewê wî dua bike û Bira hîm jî wê bona yê mayîn bibe dua. Ev in hemû tiştên ku Xwedê dixweze bo te bike. Lê tu gerekê bawerîya xwe li wan tišta bînî. Feqet, bira bawerîya te bawerîyê li hemû sozdayînên Xwedê bîne, çimkî Ew bo te ne.

### Bawerî karên Bedenê dide kivşê

Efesî 2:8 de hatîye gotinê: “Çimkî em bi kerema belap (ya jî alîyê Xwedê de dayî û kerema neqazinckirî) xilas bûne”. Gelo tu fem dikî, wekî bona xilasbûnê te tu tişt nekirîye? Ji me gelek

meriv hîmlî gunehkarên xirab bûn, wextê ku Îsa em xilas kirin. Pêşkêşa Wî, ya xilasbûnê li ser karên qence kirî, yan jî li ser karebûna kirên rast nehatiye bingehkirinê. Pêşkêşa xilasbûnê tenê bi wê menîyê hate dayînê, wekî Xwedê usa em hiz kirin, ku Kurê Xwe yî tayê tenê da, bona ku merivên ku bawerîya li Wî tînin unda nebin, lê emirê wanî heta-hetayê hebe (binihêre Yûhenna 3:16).

Keremetê em dikarin çawa hazirîya Xwedê, ya bona xebitandina karebûna Wî ya nava emirê te de hesab bikin, bona ku hemû hewcetiên nava emirê te de bèn tijîkirinê. Çawa ku Xwedê bi kerema Xwe bawerî da te, ku tu xilas bibî, usa jî bi menîya hizkirina Xwe Ewî bawerî da te, ku tu bawerîya xwe tiştên mayîn binî, hewcê kîjanayî tu. Diqewime tu bixwezî, ku merivên, ku tu hiz dikî Îsa qebûl bikin, lê rastî ew e, ku tu nikarî tu kesî mecbûr bikî, ku ew Xwedê hiz bike. Tu dikarî dua bikî, hîvî ji Xwedê bikî, wekî Ew bişuxule, lê tu nikarî bi saya kirên xwe wê yekê mîyaser bikî.

Kirên bedenê her dem mecbûr dikin, ku tu acizîyê texmîn bikî, çimkî em dicêribînin tiştêkî usa bikin, yên ku tenê Xwedê dikare bike. Em divedînin, lê em nikarin bighîjine feydayên baş. Încil dibêje, wekî Xwedê dijî wê yekê derdikeve, hêrs dikeve û usa dike, ku em binkevin, hetanî ku em fêr nebin, ku bi xwe bin destê Xwedê, yê qewat de tabin (binihêre A Petrûs 5:5).

Eger ew bawerîya, ku Wî daye te bona xilasbûnê û ew yek bes bû, bona ku tu ji hemû guneh azad bibî, wî çaxî hema ew bawerî nava te de ye, bona ku huemû hewcetiyan te, yên nava

emirê te de tijîbûyî bin. Hema bingeha hizkirina Xwedê nava emirê te de hebe, wî çaxî tu dikarî aminaya xwe li Wî bînî. Tu dikarî bi bawerîyê bigerî. Û tê dilê xwe de bizanibî, wekî Xwedê xweyê sozên Xwe ye.

Anegorî tercuma Încîlê ya berfireh, bawerî “ew e, ku şexsîtiya merivatîyê bê danînê li ser gumana Xwedê, bi heyîna bawerî û aminaya bê sînor, ya hindava qewat, serwextî, rehma Wî de” (binihêre Kolosî 1:4).

Tu bi xwe jî dikarî anegorî vê gotinê bişuxulî, wextê ku tu îzinê bidî, ku Xwedê te hiz bike. Eleqeta tevî Xwedê çiqwas qewat be, awqas jî bawerî wê mezin be. Tê bibînî, ku Xwedê karên çawa qewat nava te de dike û bi destî te usa jî bona te dike. Feqet ew hemû tişt wê wî çaxî biqewime, wextê ku eyantîya derheqa hizkirina Wî de li cem te hebe. Xwedê te hiz dike. Tu cara nava wê yekê de şikber nîbe.

## 5

### Ji tirs a azayê



*“Nava hizkirinê de tirs tune (xof tune), lê hizkirina (tam) gihîştî tirsê derdixê û hemû rêçên xofê dûr dixê. Çimkî tirs tevî xwe fikira cezakirinê tine, lê ewê ku ditirse, tê kivrê, ku ne gihîştîye gihîştîbûna hizkirinê ya tam (ew hela hê ne gihîştî ye hizkirina gihîştî)”*

— A YÜHENNA 4:18

Diqewime em bikaribin bighîjine wê xalê, li kîderê em nava bawerîyê de pêşda diçin, îtbarîya xwe li Xwedê tînin, wekî Ew me hiz dike. Û nişkêva mîrê cin tiştêkî dişîne, ku êrîşê bîne ser karê me.

Qewimandinên jîyana me, ew tiştên xirab, yên ku rastî me tèn, dikarin kontrol bikin, ku bawerîya me çî cûreyî ye û diqewime zelal bibe, ku bawerîya me tune ye. Bona hinek meriva awqasî jî dijwar nîne bawer bikin, ku Xwedê wana hiz dike, hetanî ku qewimandin mecbûr nekin ku bawerîya xwe li wana binin, ku Xwedê wana hiz nake.

Paşê dijmin bi tirsê û gunekarkirinê va tê, ku te ji wî hemû tiştî bide qetandinê, kîjan dikare alî te bike: ji hizkirina Xwedê. “Baş, tê derheqa wê yekê de çî bêjî?- mîrê cin dibêje. Ez difikirîm, wekî Xwedê te hiz dike. Eger usa nîne, bo çî tu

rastî tiştên xirab têyî? Diqewime te tişteki xirab kiriye- Xwedê bi rastî li ser te hêrs ketîye”.

Dema cêribandinê bi qezîya, tiştên nerast û neheq hêsa ye aminaya hindava Xwedê unda bikin. Her dem nîne, wekî Xwedê tişta dike, yên ku bi fikira me, Ew hema wî çaxî û wî cûreyî gerekê bike. Bernama Wî heye, ya ku diha mezin e, ne ku ya me. Ew zêdetir dixweze me biguhêre, ne ku qewimandinên nava emirê me de. Ew gelek cara tiştên usa bi tajan dide xebatê, bona ku me bighîne wê xalê, bona ku em bikaribin aminaya xwe tenê li Wî binin. Wî çaxî em fem nakin çî diqewime û em dikarin hêsa bikevine telê, bifikirin, wekî Xwedê me hiz nake. Încîl dibêje, wekî em gerekê tu cara îzîne nedin, ku tişteke me ji hizkirina Xwedê bide qetandinê, ya ku nava Îsa Mesîh de ye (binihêre Romayî 8:35-39). Wextê ku em dikevine nava tengaviyê, tiştê herî baş kîjanî em dikarin bikin, ew e, ku em bi dengê bilind dibêjin: “Xwedê, ez zanim, wekî Tu min hiz dikî û ez bawer im, wekî hizkirina Te wê alî min bike”.

Carana pêşîya dayîna tişteki Xwedê hinek wede hîvîyê disekine û nava wî wedeyî de em difikirin, wekî êdî derenge. Tu Lazer bîr tînî? Ew nexweş bû, lê Îsa awqas wext hîvîyê sekinî, hetanî ku Lazer mir, Îsa çû, ku alî wî û malbeta wî bike. Martayê gote Îsa, wekî Ew derengî ketîye, lê Îsa zanibû çî dike. Diqewime Îsa anegorî grafîka me ya çêkirî naşuxule, lê Ewê tu cara derengî nekeve. Wextê ku tu nava emirê xwe de rastî diwariyê têyî, her dem bawerîya xwe aktîv xweyî bike. Îzîne



nede ku tirs û şaşbûn hizkirina Xwedê ji te bidizin.

A Yûhenna 4:18 gotineke gelekî qewat e: “Hizkirina gihîştî tirsê dûr dixê” (NKJV). Ez her dem dora vê gotinê difikirîm, min dicêriband wê gotinê fem bikim. Û rojekê min fem kir , ku hizkirina gihîştî tirsê dûr dixê û hema Xwedê hizkirina gihîştî ye. Wextê ku tu zanî, ku ew hizkirina hindava te de çiqwasî gihîştî ye, wî çaxî tê îzinê nedî, wekî tirs serkarîyê bike. Neniherî wê yekê, wekî tu dikarî tirsê texmîn bikî, tê dîsa tevî Xwedê pêşda herî, çimkî tu zanî ku ew her dem tevî te ye.

Ew yek tiştê bûyîne nîne, ku tu ji bêaçixîyê bitirsî, eger tu zanî, wekî Xwedê te hiz dike. Tê bicêribînî aza kar bikî, çimkî tu zanî, wekî hizkirina Xwedê û begemîya Wî, ya hindava te de li ser kirina te nehatîye bingehkirinê. Eger tu Xwedê va girêdayî bî, wî çaxî tu nikarî li ber teribandînê bisekinî. Tenê wî çaxî tu dikarî li ber teribandînê bisekinî, eger tu xwe va girêdayî bî. Diqewime qewimandin usa rast peyî hev neyên, çawa ku te program kiribû, lê ew dikarin usa bèn programkirinê, eger çavê xwe li ser Xwedê xweyî bikî. Eger tu zanî, wekî Xwedê te hiz dike, tê ji neaçixîya, kêmasiyê, paşerojê, yan jî pêşerojê netirsî.

Hizkirina Xwedê awqas mezin e, wekî ew hemû tiştî vedişêre. Tu difikirî, wekî hema ew Xwedê, Yê ku tu xilaskirî, azakirî, wê usa bike, ku tu xwe bêaçix texmîn bikî? Gelo Ewê te bêyî piştgirî bihêle? Mîrê cin dijminê ruhên me ye. Ew diz e û derewîn e, lê Îsa dixweze ku emirê me hebe, em wî emirî derbas bikin (binihêre Yûhenna 10:10). Nava tercuma Încîlê ya

berfireh de gotina A Yûhenna 4:18-da nivîsar e: “Nava hizkirinê de tirs tune (xof tune), lê hizkirina (tam) gihîştî tirsê derdixe û hemû rêçên xofê dûr dixê. Çimkî tirs tevî xwe fikira cezakirinê tîne, lê ewê ku ditirse, tê kivşê, ku ne gihîştî ye gihîştîbûna hizkirinê ya tam (ew hela hê ne gihîştîye hizkirina gihîştî)” (A Yûhenna 4:18).

Wextê ku Xwedê alî min kir, ku ez fem bikim ku hizkirina Wî tirsê dûr dixê, carekê re peyî wê yekê re ez mecbûr bûm zanebûna xwe bidime xebatê. Hinek pirsgirêkên avtomaşîna me (erebe) hebûn. Em difikirîn, wekî parçekî wê wê biqete û bona guhartina wî parçê avtomaşîne pare lazim bûn ku biguhêrin. Lê parên me tune bûn. Dêmek, ew avtomaşîne me dîsa diajot, bi wê gumanê, wekî ew purçe wê neqete.

Şebeqekê min texmîn kir, ku Xwedê çawa dilê min re xeber dide, dibêje: Coys, roja xwe bi hizkirina Min derbas bike û îzinê bide, ku Ez jî te hiz bikim. Hewce nîne, ku tu tiştêkî mayîn bikî. Lazim nîne, ku tu bicêribînî bibî jina bawerîya mezin. Ew çî ku tu gerekê bikî, ew e ku tu nava hizkirina Min de bijîyî.

Min distira û derheqa Xwedê de stiran disêwirandin. Û min wedekî baş derbas dikir. Mêrê min 45 deqe pêşda jî malê derketibû, ku here ser karê xwe. Û nişkêva min dengê wî bihîst. Ewî derî vekir û got: “Ez nikarim vî tiştî çê bikim. Em gerekê avtomaşîne bibine cem hosta ku ew çê bike”.

Min derî girt û ez keniyam. Min tu cara tiştê usa nekiribû, tu cara qehrar nekiribû, ku ez niha gerekê vî cûreyî bikim. Min usa kir, çimkî min îzin dabû Xwedê ku Ew min hiz bike û min

dikaribû wextê halê dijwar bikeniyama. Jîyîna nava hizkirina Xwedê de bona bawerîyê derge vedike, bona ku Ew dewsa tirsê bikeve nava te. Ez keniyam, çimkî ew yek hema bawerî bû. Ez keniyam, çimkî kûraya ruhê xwe de min zanibû, wekî Xwedê ji me hiz dike û wê mecala bona me bide xebatê.

Birahîm bi kenê bawerîyê kenîya. Wextê ku Xwedê hate cem Birahîm û gote wî, wekî kurê jê re bibe, wî çaxî Birahîm kenîya. Ewî zanibû, wekî zarokên wî û Sarayê nikaribûn hebûna, lê Birahîm bawerîya xwe li Xwedê anî û şabûna wî werguhêzî ken bû.

Ez bawr im, wekî wextê ku em jî wî cûreyî bikin, wî çaxî bona Xwedê derge wê vebe, ku Ew bi cûrê baş alî me bike. Wextê ku pirsgirêka yekî hebe, gelo ew dikare derheqa kenda bifikire? Încîl dibêje, wekî Xwedê li ezmîn rûniştîye û li dijminên Xwe dikene. Eger Xwedê dikare wê yekê bike, wî çaxî em jî dikarin wê yekê bikin. Pêşda bilive û bi kenê bawerîyê bikene. Çawa jî hebe, Xwedê te hiz dike. Eger Xwedê li aliyê me ye, wî çaxî kî dijî me ye?

## 6

# Hizkirin dest dirêj dike



*“Û Ewî ev temî (borcdarî, emirkirin) daye me, wekî ewê ku Xwedê hiz dike, wê birayê xwe (bawermend) jî hiz bike”.*

— A YÛHENNA 4:21

Tu lawê Xwedêyî cuda yî. Ew derheqa wê yekê da Qanûna Ducarî 7:6 de dide eyankirinê. Eger tu çawa lawê Xwedêyî cuda bişuxulî, wî çaxî tê destpê bikî vê dinîyayê bidî guhartinê. Tê bi kenê ber devê xwe herî sûpêrmarkêtê û vî cûreyî bifikirî: *Ez hizkirî me. Nava jîyana min de hemû tişt baş e. Ez dikarin yên mayîn bi wê hizkirinê dua bikim, kîjanê ez ji Xwedê texmîn dikim.* Kuda jî herî, her dem şa bibe û şabûna te bona yên mayîn wê bibe dua. Zebûr 100:2 de tê gotinê, wekî em gerekê “Bi şabûn qulixî Xudan bikin”.

Wextê ku em destpê bikin fem bikin, ku em nava hemû bernamên Xwedê da cîhekî çawa cuda cîhê xwe digrin û destpê bikin bişuxulin, bi zanebûna wê yekê, wekî Ew me hiz dike. Wî çaxî em dikarin vê jîyanê bona Îsa hildin. Û hizkirinê lez belav bibe. Hizkirina Xwedê, ya ku ji te derdikeve, wê gelekî fesal be, ku êşê negihîne merivên mayîn. Hizkirina Wî, ya ku nava te de ye, wê te ji tirsê bide azakirinê û tê netirsî, ku tu bi hizkirina

xwe destê xwe dirêjî merivê mayîn bikî. Tê ji înkarkirinê netirsî, yan jî ji wê yekê netirsî, ku tu hindava yê mayîn de zêde yî. Hizkirina Xwedê wê hewcetiyan meriva bibîne û wê bicêribîne wana tijî bike.

Xwedê dixweze, ku tu bawerîya xwe wan gotina bînî, wextê ku Ew dibêje, wekî bi saya te Ewê karê diha mezin bike, çimkî Îsa çûye Cem Xwedê. Tu bi rastî bawer dikî, wekî Xwedê wê te bide xebitandinê? Xwedê wê hemû tiştî bide te, eger tu Wî bawer bikî. Tu gerekê bona avîtina wê gavê netirsî.

Eger ez nikarim te re gilî bikim, ku ez çend cara li ber niçê “zinarê bawerîyê” sekinîme, wextê ku min cêribandiyê tiştêkî bi tirs bikim. Û Xwedê gotîye min: “Pêşda here Coys, ezê bi destî Te karên diha mezin bikim. Pêşda here”. Û ez li merkeza wî zinarî banzdame û Xwedê tu cara îzin nedaye ku ez jorda bikevim.

Tö zanî, ku ez bo çi gerekê bona pêşdaçûyîne û neaçixîyê xemgîn nebim? Çimkî ez zanim, wekî Xwedê min hiz dike. Ew min hiz dike û zane, wekî ez jî Wî hiz dikim û bi saya kerema Wî min emirê xwe teslîmî Wî kirîye. Eger te jî wî cûreyî kirîye û tu Xwedê hiz dikî, zanî, wekî Ew jî te hiz dike, wî çaxî pirsgirêka te, ya usa wê tunebe, kîjanê tu nikaribî alt bikî.

Eger tu bi bêqelpî dixwezî alî meriva bikî, wî çaxî Xwedê wê alî te bike, ku tu alî wan bikî. Mecala mezin lazim nîne, lê tu gerekê bona Xwedê nêzik bî, lê tiştên mayîn Xwedê wê mîyaser

bike. Diqewime tu bifikirî, wekî talanta te ya sade heye, lê carana tiştên usa diqewimin, wekî tiştên here biçûk jî dikarin qewat bibin.

Nava jîyana xwe de tu cara xwehiz nîbe, bi fikira wê yekê, ku tu li ser xwe bêyî merkezkirinê, ku hewcetiye te tijîbûyî bin. Çi ku tu dixwezî bi cûrê zelal û lez bêje Xwedê, paşê bawerîya xwe bide kivşê, bona ku tu hewcetiye merivên başqe çareser bikî. Eger bona yekî tu tiştêkî bikî, wî çaxî Xwedê jî wê ewê yekê bo te bike. Eger hewcetiye te heye, wî çaxî bona daçikandinê hazir be, lê ne ku tenê derheqa hewcetiye xwe de bifikire. Wextê ku tu destê xwe dirêjî merivên başqe dikî Xwedê wê yekê çawa toxim qebûl dike, kîjanî tu diavêjî, ku nava jîyana xwe de paşê tu berev dikî.

Her kes dixweze bi jîyana baş va bijî, lê bona me lazim e fem bikin, ku emirê başî rast kîjan e. Ez wê yekê dicêribînim çawa karebûn nav bikim, bi xebitandina karebûna Xwedê, bona ku hemû hewcetiye te tijîbûyî bin. Hizkirina Xwedê wê mecalê bide, ku tu hewcetiye merivên başqe cîhên ewlin de daynî. Gelo tu li ser wê fikirêyî, wekî Xwedê te awqasî hiz dike û ewê usa bike, ku tu bikaribî bi hizkirin destê xwe dirêjî meriva bikî, usa jî merivên nerazî, kîjana hêsa nîne hiz bikin?

Hewce nîne, ku tu bona hizkirina kesekî cedandina bidî xebatê, yê ku te hiz dike. Feqet em gerekê qewata Xwedê hîvî bikin, bona ku em bikaribin wana hiz bikin, yê ku me

hiz nakin. Hizkirina Xwedê dikare wê yekê mîyaser bike, çimkî ew hizkirin tiştên başqe va girêdayî nîne. Hizkirinê em belaş distînin û em dikarin belaş jî bidin. Hizkirin tu cara nayê teribandinê, yan jî meriva tenê nahêle. Diqewime salek, pênc, yan jî 25 sal bên xwestinê, lê hêja ye, ku hîvîya wê hizkirinê bin. Nava wî wedeyî de Ew dîsa te hiz dike. Hizkirin sebir dike û pê re jî bi rehî û şikestî ye. Ew ya xwe nagere û zû naxeyde. Bi saya hizkirina Xwe Îsa hemû aliyên baş yên nava hizkirinê de da der. Em jî dikarin bona merivên xeyîdî û undabûyî wê yekê bikin, yên ku bona dîtina wê yekê, ku Xwedê çawa li vê cihanê dişuxule, hewce ne.

Xwedê te h'iz dike û Ew usa jî merivên dor- berê te hiz dike. Ew wan meriva hiz dike, bi hesabhilnedana wê yekê, ku ew xilasbûyî ne, yan na. Û Ew dixweze, ku bona deranîna hizkirina Xwe te çawa kanî bide xebatê.

Ji pêşdaçûyînê netirse. Hizkirina Xwedê te ji tirsê û gunehkarîyê aza dike û Xwedê karebûna hizkirinê daye te. Nava karê belakirina hizkirina Xwedê de, ya dora xwe de dudilî nebe. Nêzikaya tevî meriva werguhêzî karê xweyî hîmlî bike û tu kuda jî herî, bona meriva bibe dua.

Mêvanhizîya hindava mêriv rêke bona nîşandayîna hizkirina te ye, bi taybetî hindava wî de, yê ku tenê ye û gumana wî jî hatiye birînê. Meriva teglîfî şîvê bike, îzinê bide, ku meriv bên mala te. Meriva slav bike, destê xwe bike destê wan û wan

re bikene. Meriva hembêz bike, wextê ku hewcetiya wê yekê heye. Alî bike û bi avtomaşîna xwe bibe cîhê xebata wana, avtomaşîna kîjanî naxebite. Li cîhê xebatê nasîya xwe bide xebatkarên nû û pêşniyar bike, ku tê alî wana bikî, ku nasîya wan bidî bajêr. Xwedê wê bona te tiştekî bike. Diqewime ew yek tiştekî mezin nîbe, yan jî berbiçav nîbe, lê wê tiştek be, kîjan bona Wî girîng e. Meriv bona Xwedê girîng in.

Hene meriv, bo kîjana tu tenê dikarî qulix bikî. Hîvî ji Xwedê bike, ku Ew nîşanî te bide, ku tu çawa dikarî bi hizkirina Wî destê xwe dirêjî wan meriva bikî. Û Xwedê wê te fêr bike.



# 7

## Hizkirina Xwedê wê te biguhêre



*“Hizkirin nava vê yekê da ye, wekî ne ku me Xwedê hiz kir, lê Ewî em hiz kirin û kurê Xwe şand (mecalâ baxşandinê) çawa baxşandina gunêhên me”*

— A YÛHENNA 4:10

Xwedê me hiz dike, lê ez nafikirim, wekî ji me gelek meriv bi rastî wê hizkirinê fem dikin, bi kîjanê Ew me hiz dike. Wextê lêkolînkirina dora vê têmayê, Xwedê nîşanî min da, ku eger em di kûraya ruhê xwe de bizanibin, ku Ew me çiqwasî hiz dike, wî çaxî emê cûrekî mayîn bin, lê ne ku çawa nihane.

Dora hizkirina Xwedê bifikire. Ewê te biguhêre. Diqewime tişteki te va girêdayî li te xweş nayê, lê tu zanî, wekî Xwedê te hiz dike. Wextê ku tu hîvîyêyî, wekî Xwedê di nava te de bişuxule û te biguhêre, wî çaxî hizkirina Wî wê alî te bike, ku tu lezetê ji wê yekê bibînî. Eger tu ji şaşîya her dem razî nîbî, tê tu cara neyêyî guhartinê. Bila bîra te de be, wekî Xwedê bi rîya bawerîyê dişuxule û bi rîya bawerîya rast em dikarin bikevine nava rihetîya Xwedê (binihêre Îbranî 4).

Ez li ser wê fikirê me, wekî gelek xwendevanên vê kitêbê tevî xwe nava eleqeta xirab de nin. Ew xwe hiz nakin. Eger tu xwendevanekî vê kitêbê ye wî cûreyîyî, yê ku tevî xwe ketîye nava şerkarîyê, wî çaxî ez dixwezim bîr bînim, wekî tu dikarî karên xweye xirab hiz nekî, lê bi xwe gerekê tu cara xwe re şer nekî. Îsa ji hizkirina Xwe ya mezin bona te mir û tiştê herî biçûk, yê ku tu dikarî bikî, qebûlkirina pêşkêşa Wî, ya giranbiha ye.

Încîl dibêje: “Çimkî ew çawa dilê xwe de hesaba dike, usa ye” (Gotinên Silêman 23:7). Eger tu derheqa xwe de bi fikira xirabî, xwe hesab dikî çawa merivekî nelazim û fem nakî, wekî tu bi çiqwasî va cuda yî, wî çaxî tu nikarî rast bişuxulî. Menî ew e, wekî te dilê xwe de bi rastî ew tiştên qewat, ku emir diguhêre, fem nekirîye, wekî Xwedê te diha gelekî hiz dike, ne ku çawa tu zanî.

Xwedê dixweze, ku tu her roj wede tevî Wî derbas bikî. Ewê te biguhêre. Eger tu Xwedê danaynî cihê ewlin, wî çaxî tu Wî datînî cihêkî usa, ji kîderê Ewê nikaribe bona te wê yekê bike, çî ku Ew dixweze. Tu gerekê wedê şexsî tevî Xwedê derbas bikî, Wî hiz bikî û îzinê bidî, ku Ew jî te hiz bike. Ew yek wê te werguhêzî merivekî qewat, serbixwe û gihîştî bike.

Gelek meriv menîya digerin, lê tu cara wede bona çêkirina eleqeta tevî Xwedê başqe nakin. Ewê bixwezin, ku eleqeta baş tevî Xwedê hebe, lê ew nava wê pirsê de bi dîsîplîn nînin û ew nava xwe de xeysetê baş pêşda nabin, wek mînak perwerde

û dukirinê. Bona merivên başqe kirina tiştêkî dewa dissîplinê dike, ew yek gerekê bibe xeyset.

Hizkirina Xwedê wê we biguhêre. Wextê ku tu hizkirina Wî li ser xwe texmîn bikî û her dem tevî hizkirina Wî nava kar de bî, wî çaxî tê bibînî, ku xwestinên te tînguhartinê. Tê bixwezî bibî mînanî wî Kesî, Yê ku te hiz dike (mînanî Îsa). Nava jîyana me de naskirin û pêşxistina xeysetê Xwedê gerekê pirsra here girîng be. Pawlos dibêje, wekî meremê îzbatbûyî naskirina Mesîh û qewata hilatina Wî ye (binihêre Fîlîpî 3:10). Hîvî dikim, ku tu guhdariyê bidî ser wê yekê, wekî Pawlos dibêje, ku ew gerekê îzbatbûyî be.

Bi cûrê rast nêzîkî eleqeta tevî Xwedê be. Tu dikarî tevî Xwedê awqas nêzîkbî, çiqwas tu bixwezî. Hemû tişt wê yekê va girêdayî ye, ku tê çiqwas wede bona Wî başqe bikî.

Încîl dibêje, wekî em wekîlên Xwedê, yê şexsî ne û Ew banga Xwe bi destî me dîyar dike (binihêre B Korintî 5:20). Ev xeber her dem dilê min dide leqandinê û dibe menî, wekî ez ji nû va fem bikim, ku çiqwas girîng e, wekî em peyî rêberîya Ruhê Xwedê herin, çimkî Ew nava me de dişuxule, me diguhêre û me dike anegorî mîyaserkirina meremê Xwedê. Hizkirina Xwedê dilên me de bi destî Ruhê Pîroz raxistî ye (binihêre Romayî 5:5). Wê hizkirinê qebûl bike û izinê bide, wekî Ew te biguhêre.

## Usa bike ku cêribandina te, ya emirê nû, hebe



Eger te tu cara Îsa dewat nekiriye, ku Ew bibe Xudan û Xilazkirê te, wî çaxî ez pêşniyar dikim, ku tu wê yekê niha bikî. Tu dikarî anegorî van xebera dua bikî, ku eger bi dilê paqij dua bikî, wî çaxî tê nava Mesîh de cêribandina emirê nû dest bînî.

*Bav Xwedê, ez bawer im, wekî Îsa Mesîh Kurê Te ye, Xilaskirê vê cîhanê ye. Ez bawer dikim, wekî Ew li ser xaç bo min mir û Ewî hemû gunêhên min hildane ser xwe. Ew ji nava mirîya rabû bi wê yekê hindava mirinê û mexber serket. Ez bawer im, wekî Îsa niha sax e û li aliyê Te, yê rastê rûniştîye. Îsa, ez hewcê Te me. Gunêhên min afû bike, min xilas bike û nava min de bijî. Ez dixwezim careke mayîn pêşda bêm. Ez dixwezim bo Te bijîm. Ez razî me, ku Te ez xilas kirime, Tu alî min dikî, ku bona Te bi jîyîana nû bijîm.*

Niha bawer bike, wekî Îsa dilê te de dijî. Bawer bike, wekî tu hatî baxşandinê, bi saya xwîna Îsa hatî afûkirinê û tê herî ezmîn, wextê ku wedê teyî li ser vê cîhanê nêzîkî serhevdahtinê bibe.

Here li civîneke baş, li kîderê Gotina Xwedê hîn dike û nava Mesîh dae bighîje. Bêyî zanebûna Gotina Xwedê nava emirê te de tu tişt nikare bê guhartinê. Nava gotinên Yûhenna 8:31-32 de hatîye gotinê: “Eger hûn nava gotina Min de bin, wî çaxî

hûn şagirtên Min, yên rast in. Û hûnê rastîyê nas bikin, û rastî wê we aza bike” (KJV).

Ez bang dikim, ku hûn wê Gotinê kûraya dilê xwe de binikînin. Anegorî gotina B Korintî 3:18, eger tu peyî Gotinê herî, wî çaxî tê bêyî guhartinê, bibî mînanî şikilê Îsa Mesîh.

Hivî dikim, ku tu min re binivîsî, ku ez bizanibim, wekî te Îsa qebûl kirîye û kitêboka belaş ya biçûk dest bîne, ya derheqa wê yekê de, ku çawa meriv dikare emirê xwe yê nû nava Mesîh de destpê bike.

*Bi hizkirin:*

*Coys.*

## Derheqa xudana kitêbê de

**Coys Mayêr** dersdareke fêrkirina Încîla praktîk e. Ew xudana çapa ewlin, ya kitêba A # 1 New York Times-ye, ya ku diha gelekî hatîye frotanê. Ewê jî 70-êyî zêdetir kitêb nivîsîne, dikevîne nava kîjana k'itêbên bi sernavê “Jina serbixwe”, “Bila serxbiwebûna te hebe”, usa jî kitêba bi sernavê “Fikir deşta şêr e”, ya ku bona temamiya malbetê têra hatîye dîtînê, kitêba “1 Pênnî” û gelek kitêbên mayîn. Ewê jî bi hezara dengnivîsar hazir kirine û pê re jî arşîva vîdeoyê hazir kirîye. Progiramên tîlêvîzîonê û radyoyê, yên bi sernavê “Emirê roja îroyîn derbas bikin” li temamiya dinîyayê tèn weşandinê. Ew gelekî rêwîtiyê dike û civîna derbas dike. Coys û malxwê wê- Dêyv xweyên çar zarokên gihiştî ne û li Sênt Lûîsê, li Mîssrûîyê dijîn.

## Duayê xilazbûnê

Xwedê te hiz dike û Ew dixweze tevî te nava eleqeta şexsî de be. Eger te Îsa Mesîh hela hê çawa Xilaskirê xwe qebûl nekiriye, wî çaxî dikarî wê yekê hema niha bikî. Dilê xwe li ber Wî veke û vî duayî dua bike...

“Bavo, ez zanim, wekî ez li ber te gunekar im. Ez hîvî dikim, ku Tu min bibaxşînî. Min paqij bike. Ez soz didim, ku aminaya xwe li Mesîh- Kurê Te, bînim. Ez bawer dikim, wekî Ew bona min mir. Ewî gunehê min hilda ser Xwe, wextê ku Ew li ser xaç mir. Ez bawer dikim, wekî Ew ji nava mirîya rabûye. Hema niha ez emirê xwe didime Îsa. Bavo, bona pêşkêşa baxşandinê, ku Te daye û bona pêşkêşa emirê heta-hetayê ez razî me. Hîvî dikim, ku Tu alî min bikî, ku ez bo Te bijîm. Bi navê Îsa, amîn”.

Eger te ji dilê xwe dua kir, wî çaxî Xwedê tu qebûl kirî, Ewî tu paqij kirî, ji mirina ruhanî tu aza kirî. Wede başqe bike, bona ku tu van gotinên Kitêba Pîroz bixwîni û lêkolîn bikî, pê re jî hîvî ji Xwedê bike, ku Ew tevî te xeber bide, wextê ku tu tevî Wî vê rêwîtiya nava emirê xweyî nû de mîyaser bikî.

Yûhenna 3:16

Efesî 1:4

A Yûhenna 1:9

A Yûhenna 5:1

A Korintî 15:3-4

Efesî 2:8-9

A Yûhenna 4:14-15

A Yûhenna 5: 12-13

Dua bike û hîvî ji Wî bike, ku tu civîneke baş bibînî, ya ku bawerîya xwe Încîlê tîne, bona ku tu bikaribî nava eleqeta tevî Mesîh ruhdarkirî bî. Xwedê her dem tevî te ye. Rojekê Ewê wede de rêberîyê li te bike û wê nîşanî te bide, ku çawa meriv dikare bi emirê tijîbûyî bijî, yê ku Ewî bona te çê kirîye.



BO ÎSBATKÎRÎNA ELEQETA TEVÎ XUDANA KÎTÊBE

EM HÎVÎ DÎKÎN BÎNÎVÎSÎN:

Joyce Meyer Ministries  
P. O. Box 655  
Fenton, MO 63026  
USA  
(636) 349-0303 [www.joycemeyer.org](http://www.joycemeyer.org)

Joyce Meyer Ministries—Canada  
Lambeth Box 1300  
London, ON N6P 1T5  
Canada  
1-800-727-9673

Joyce Meyer Ministries—Australia  
Locked Bag 77  
Mansfield Delivery Centre  
Queensland 4122  
Australia  
(07) 3349 1200

Joyce Meyer Ministries—England  
P. O. Box 1549  
Windsor SL4 1GT United Kingdom  
01753 831102

Joyce Meyer Ministries—South Africa  
P. O. Box 5  
Cape Town 8000  
South Africa  
(27) 21-701-1056

Bona temaşekirina berbirîbûnên Coys li vê malperê biqesidin:  
[tv.joycemeyer.org](http://tv.joycemeyer.org)



## **Hizkirina Xwedê ya hindava we de eşkere bikin Hizkirina Wî ya beyfî tu qewil û qehrara**

Qewat û hizkirina Xwedê hema îro bi temamî yên we ne. Hûn yekî nenasî ji cimeata berevbûyî nînin. Xwedê we usa hiz dike, çawa ku hûn li ser vê cihanê merivê tek tenê bin. Pirsgirêk ew e, wekî hûn mînanî geleka dikarin vê yekê fem nekin... yan ji bi fikira xwe bizanibin, lê dilê xwe de texmîn nekin. Niha hûn wê yekê dikarin bikin. Berbirîbûna vê kitêbê ya ku ruhdar dike wê we hîn bike:

- Çawa hizkirina Xwedê ya dilê we de nas bikin?
- Çawa nefikirin ku gelo hûn bo Xwedê baş in?
- Hûn çawa dikarin eyantiya derheqa hizkirina Xwedê de li ser xwe texmîn bikin?
- Çawa Xwedê nava qewilên dijwar de bibînin?
- Hizkirina Xwedê wê çawa we heta hetayê biguhêre?

Coys Mayêr eşkerekirinên xwe û wê eyantiyê, ku jîyana wê guhart, raber dike. Ew parçên ji Încilê û gotinên serwaxt pêşniyar dike, kîjan dikarin pencerên hizkirina Xwedê vekin... û îzinê bidin ku ronahiya wê hizkirinê hema li ser we biçûrise.